## Ronakbîrekî Jibîrkirî: Mehmed Mîhrî Hîlav

Di lîteratura ronakbîrîya kurd de kêmbûn/tunebûna biyografiyên têrûtijî û berfireh yek ji kêmasîyên sereke ye. Biyografî dikare rê bigre li ber jibîrkirina kesayetên di dîroka neteweyekê de keda wan heye an li çand û dîroka neteweya xwe zêde kirine. Wek şaxeke zanîna dîrokî jî mirov dikare li biyografiyan binêre. Ji ber ku şexsiyetên navdar an berhemdar ligel qabiliyetên û zîrekbûna xwe berhemên peywenda çandî, siyasî, aborî hwd. a dewra xwe ne jî. Mirov dikare di neynika jiyana şexsekî re bi giştî li serdemekê binêre, fam bike, li ser bifikire û wê şîrove bike. Lewma dikare zanîna me ya derbarê rabirdûyê de kûrtir û berfirehtir bike.

Wek mînak mirovekî wek Celadet Alî Bedirxan ku belkî sîmayê zêdetirîn naskirî yê ronakbîrîya kurd e, agahiyên derbarê wî de hê jî ne li ser hev in. Herwiha Şêx Seîdê ku ew jî yek ji navdartirîn şexsiyetê kurd ê sedsala 20mîn e, em ji berhemeke bi rêkûpêk li ser jiyana wî bêpar in. Em nizanin ka şexsiyet û nasnameya wan a ku îro pê tên naskirin çawa şikil girt, çiqas jê bandora malbata wan bû an derdora wan a zaroktiyê bû, çiqas jê bandora perwerdeya wan, xwendinên wan, mamosteyên wan bû. Halûmercên wê dewra wan çawa berê jiyana wan guhert an ew bixwe di kîjan merhaleyan re derbas bûn? C. A. Bedirxanê em bi kovara *Hawar*ê nas dikin û yê bîst sal beriya wê gelo çiqas dişibin hev? Di xortaniya xwe de, dema çavê wî li dinyayê vedibû di bin bandora kê de ma? Şêx Seîd beriya 1925a çi dikir? Zaroktî û xortanîya wî di derdoreke çawa de derbas bû? Bi kê re dida û distend? Ew di kîjan merheleyan re derbas bû heta ku bû pêşengê serhildaneke ewqas girîng? Pirs gelek in. Her çiqas bersiva hemû pirsan belkî wê tunebe jî, pirs û lêgerina bersivên wan bixwe jî dikare bi serê xwe asoya mirov firehtir bike. Helbet her bersivek wê bibe kevirek di hîmê zihna me ya derheqê rabirdûyê de.

Yek ji ronakbîrên kurd ên destpêka sedsala 20mîn ku heta niha kêm hatiye naskirin Mehmed Mîhrî Hîlav e. Bi saya xebata Seîd Veroj (*Mehmed Mîhrî Hîlav û Kovara Kurdistan*, İsmail Beşikçi Vakfı Yayınları, 2015) Hîlav ji kêm ronakbîrên kurd e ku êdî biyografiya wî heye û agahiyên derbarê wî de di pirtûkekê de li ber dest in.

### Mehmed Mîhrî Hîlav kî ye?

Hîlav bi eslê xwe ji Rojhilata Kurdistanê ye û di 1885a de li gundê Deşîyê ya bi ser bajarê Sinê ve hatiye dinyê. Di zaroktiya xwe de bi zîrektiya bal kişandiye û li bajarên Bêzar, Sinê, Serdeşt û Hewlêrê xwendina medreseyê temam kiriye û îcazeta melatiyê wergirtiye. Piştî vê jî rêwitiya wî naqede, tê demekê li Wan, Qers û Erziromê jî dimîne û sala 1911ê de derbasî Stenbolê dibe û carek din venagere Kurdistanê. Li vir ligel Medreseya Fatihê, Fakulteya Hiqûqê jî xilas dike. Di heman medreseyê de dersên erebî, farisî, gramer û felsefeya dînî dide. Piştî sala 1921ê, wek yekemîn parêzerê dest bi parêzerêyê jî dike. Ji bilî zimanê xwe kurdî zimanên tirkî, erebî û farisî û edebiyata wan jî baş nas dike qasî ku li ser wan binivîsîne û mamostetî bike.

### Li Stenbolê xemxur û ramangerekî kurd

Hîlav li Stenbolê ku destpêka sedsala 20mîn de gelek ronakbîr û xwendekarên kurd ên ji gelek deverên Kurdistanê li hev civiyane, di nav kar û xebatên çandî yên kurdan de cî digre. Di rojname û kovarên *Rojî Kurd, Hetawî Kurd, Jîn, Hetawî Hewlêr* û *Kurdistan*ê de li ser babetên

curbecur bi kurdî û tirkî dinivîsîne. Bixwe xwediyê kovara Kurdistanê ye ku sala 1919a dest bi weşanê dike. Ji xeynî gotarên di kovar û rojnameyan de nivîskarê çar pirtûkan e ku bi zimanê tirkî hatine nivîsandin. Yek ji van *Mukaddimet-ûl Îrfan* e ku yek ji xebatên berdest ên ewilîn û sereke ye derbarê fonetîk û zaravayên kurdî ye. Piştî serhildana Şêx Seîd wek ronakbîr û çalakvanên din î kurd ji ber îstîbdada rejima komara nû-ava êdî di nav ti çalakiyan de xuya nake Mehmed Mîhrî. Piştî Şer bi ronakbîrên wek Musa Anter, Seîdê Kurdî û xwendekarên ji nifşê nû dikeve têkiliyê. Di *Dicle Kaynağı* ya Musa Anter de dinivîsîne, alikariya madî ya komeleyên xwendekarên kurd dike hwd. Di pirtûkê de diyar e Mehmed Mîhrî bi taybetî di warê rewşa çand û zimanê kurdî de xemxurek e û her dem xwestiyê tevkariya pêşketina kurdan bike. Derbarê ramanên wî, gotar û pirtûkên wî agahiyên berfireh hene di pirtûka Seîd Veroj de lê ya girîng dema mirov vê pirtûkê dixwîne rê li ber kîjan hest û ramanan vedike gelo?

**Têkçûn, windabûn**

Portreyê giştî yê Mehmed Mîhrî, ya rast, portreyeke giştî ya piraniya ronakbîrên kurd ên sed û pêncî salên dawî ye jî. Destpêkê de li Stenbolê wek kurdekî zîrek, bi hewes û serkeftî bi saya di nav şert û mercên dewra xwe de bi gelek meseleyên siyasî û çandî yên derbarê kurdan re serê xwe diêşînî, dinivîsîne, weşangerî dike, dibe ramangerekî dewra xwe. Wek endamekê neteweya xwe di warê çandî de çi destê wî dike. Piştî avabûna Komara Tirkiyeyê bayê felekê li wan dixe ronakbîr û çalakvanên kurd ên li Stenbolê ji hev belav dike. Ji ber îstibdada rejima nû êdî bi her awayî cî ji xebatên çandî re û derbirîna kurdbûnê namîne; hin ji wan hemû hêza xwe didin xebatên siyasî, serî hildidin, tên kuştin an sirgun dibin. Encam têkçûneke xedar e. Ên dimînin xwe bêdeng dikin, ji kurdabûna direvin an didin jibîrkirin. Wekî din ti çare nîne.

Mehmed Mîhrî ku li Stenbolê dimîne, herçiqas em ji têkiliyên wî yên salên 1950yan derdixin ku kurdbûna xwe ji bîr nekiriye jî, ew di xwe de veşartiye, qet derbasî zarokên xwe nekiriye. Em dibînin zarokên wî heta piştî mirina wî jî haya wan ji nivîsên bavê wan î bi kurdî tuneye. Dema xalê bavê wan ji Kurdistanê tê û bi wî re dipeyive dengê kurdî dibihîzin. Bavê wan di 20 saliya xwe de fêrî tirkî bûye û lê zarokên wî peyvek kurdî nizanin. Ji kurtejiyana wan xuya dike Mehmed Mîhrî, ku ramangerekî kurd î navdar bû beriya salên 1920an, ew wek tirk mezin kirine. Ji bilî kurdbûna xwe hemû zanyariya xwe bi wan re parve kiriye ew û gelekî baş gihandine. Bi taybetî yek ji kurên wî Selahattin Hîlav wek doktorê felsefeyê dibe şexsekî naskirî di nav ronakbîrên tirk de. Bi berhemên xwe û wergera gelek berhemên sereke li ronakbîriya tirka gelek tişt zêde kiriye. Kurê din Necmeddîn Hîlav, her çiqas berhemên wî nivîskî tunebin jî, ew wek bengînê xwendin û pirtûkan mirovekî naskirî bûye... Bi kurtasî, kok û hafizeya Mehmed Mîhrî ya kurdbûnê hişk dibe, derbasî nifşê nû nabe.

Mehmed Mîhrî mînakek e ku zîrektî û berhemdariya mirovan çawa dikare bêyî îradeya wan ziwa bibe, li ber bayê biçe. Mirov difikire ger bi komara Tirkiyeyê re dewleteke kurd jî ava bibûya bi ihtimaleke mezin ew ê bibûya burokrat an ronakbîrekî mezin; ji aliyê nifşên îro jî bihata naskirin; berhemên wî di dibistanan de bihata xwendin. Ya girîngtirîn mîrata xwe ya çandî wê karibûya derbasî zarokên xwe jî bikira û bidaya dewamkirin. Wê îro tenê ji aliyê çend lêkolînerên kurd ve nehata naskirin. Zarokên wî tevî mîrata wî nedibûn milkê tirkan...

**Sedsal berê û îro**

Sedema ku serpêhatiya Mehmed Mîhrî îro dilê mirov diêşîne ew e ku rewşa ronakbîrên kurd pir zêde neguheriye. Rewşa siyasî û çandî îro li bakurê Kurdistanê di nav têkçûneke din de ye. Gelek sazî û weşanên kurdî hatine girtin. Ji aliyê bîr û bawerî û hêviyê serdemek e din e ku dibe sedema gumana ku ew kar û xebatên di du sê dehsalên dawî de hatine kirin bibin malê arşîvan; di civakê de cîyê xwe nebînin; derbasî nifşên nû nebin çawa ku Mehmed Mîhrî nikaribû çanda xwe derbasî zarokên xwe bike. Ronakbîr û nivîskarên kurd ew rîsk li pêşiya wan e ku dev ji xebatên xwe heta belkî dev ji hêviyên xwe berdin bêyî ku rehên xwe berdin ziwa bibin.

Jixwe heta niha jî dema em li piraniya kesayetên naskirî yên di nav siyaset û çanda kurdî de dinêrin, zarokên ew mezin dikin zêde ferqa wan ji zarokên tirk tunene, ne nivîskar û ronakbîrên kurd nas dikin, ne ji çanda kurdî haydar in ne jî jiyane xwe de pirtûkek kurdî kirîne û xwendine. Em ê bikaribin ji qedera ku Mehmed Mîhrî rûbirû mabû an ji çembera têkçûnan xilas bibin an nebin ne diyar e.

**Kovara *Kurdistan* û ermen**

Nivîsên Mehmed Mîhrî dikare ji gelek aliyan ve bê şîrovekirin lê çend nivîsên di Kovara *Kurdistan* (1919) de bi taybetî divê liser bên sekinandin. Ji ber ku ev mesele hê jî neqediyaye û her tim tê rojevê. Bo lêkolîneke derbarê dîroka têkiliyên ermen û kurd jî dikare bibe çavkanî. Ji ber ku di nav çarçoveya nîqaşên bo Prensîbên Wilson babeta serweriya neteweyî yên ermen û kurdan nîqaşeke gur heye. Ev nîqaş bêtir di ser gelheya kurd û ermenan re tê kirin. Nivîseke Hîlav, wek bersiva rojnameya *Orient News* (r.240) bi vî awayî ye. Bi israr îdia dike gelheya kurdan li wan şeş wilayetan ji ya ermenan zêdetir e. Li hemberî aligiriya ermenan, ku bi heqaret û pêşdarazî qala kurdan dike, wan bi qirkirina ermenan sucdar dike û armanc dikin wan ji mafên neteweyî pêbar bihêlin, dikêve polemîkê û bersiv dide hemû îdiayên wan.

Di kovarê de nameya Sertîbê Dêrsimîyê (r.258) ji eşîra Kurmanc bixwe wek belgeyeke dîrokî ye tevî nameya xwînerekî din (r.261) û telgrafa ji Elezîzê bo Kurdistan Tealî Cemiyetî û bersiva wê (r. 265-67), dikare wek bersivek bo nivîsa di *Orient News* û îdiayên derbarê qirkirina ermenan de bê xwendin. Sertîbê Dêrsimî, behsa şahidiya xwe ya tehcîr û komkujiya ermenan dike û dibêje ev gotina rayedarên dewletê ber guhê wî ketiye “me yên dibêjin ‘zo’ xilas kirin, îjar dor hat ên dibêjin ‘lo’.” Behsa tehcîr û komkujiya kurdan ku di 1916a de dest pê kiriye jî dike û gazinên xwe dike digel ku tehcîr û komkujiya ermenan her dem tê rojevê ya kurdan nakeve rojevê û nayê qalkirin. Ev gotina wî dike ku mirov dîsa bi îroya me re berawirdkirinekê bike. Îro jî piraniya siyasetmedar û ronakbîrên kurd (û elbet yên tirk) nayê dîtin ku qala tehcîr û komkujiya kurdan a di Yekem Şerê Cîhanê de bikin. Bi ser de kurd hemû tawanbarkirinan dipejirînin û lêborîn dixwazin! Kurd çiqas tên sucdarkirin û heta tên bêqîmetkirin, ermen ewqas masûm, ji xeletiyan azade tên nîşandan û berzkirin. Hindik maye di vê meseleyê de tirk ji navberê derkevin an bên jibîrkirin û bi temamî bibe meseleyek navbera kurd û ermenan de.